
Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 948 13-Adar- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
@rojnameyaronahî
+963 052 423165
423165
+963 938541707

الوكيل الحصري للتوزيع
شركة الشمال
shrktronahi@gmail.com
0998723906
المكتب الرئيسي: قامشلو - دوار سوني

# Bi aqilê çêkirî ‘hizra nêzî mirinê’

Ofîsa Mafê Telîfê ya Emerîka’yê (USCO) berhemên hunerî yên ku bi temamî ji hêla aqilê çêkirî ango bi saya kompûterê hatiye çêkirin, qebûl nekirin û mafê telîfê neda wan.
Ofîsa Mafê Telîfê ya Emerîka’yê (USCO) berhemên hunerî yên ku bi temamî ji hêla aqilê çêkirî ango bi saya kompûterê hatiye çêkirin, qebûl nekirin û mafê telîfê neda wan.
Xwedî û CEO’yê şirketa “Imagination Machine” Dr. Steven Thaler bi aqilê xwe yê çêkirî “Creativitiy Machine” berhemeke hunerî (tablo) ya bi navê “A Recent Entrance to Paradise” çêkir û ji bo mafê telîfê miracaetî USCO’yê kir, lê miracaeta wî nehat qebûlkirin. Thaler sala 2018’an jî ji bo telîfê miracaet kiribû, lê dîsa miracaeta wî nehatibû qebûlkirin. USCO diyar kir ku ew tenê dikarin mafê telîfê bidin berhemekî ku aqilê însanekî ew çêkiriye. Komîteya lêkolînê ya USCO’yê got mafê telîfê tenê piştgiriyê dide berhemên ku bi aqilê însanan hatiye çêkirin.
Berhemê ku bi saya “Creativity Machine” hatiye çêkirin ji dîmenekî rêya trênê pêk tê. Bi temaya “hizra nêzî mirinê” hatiye çêkirin. Rêyeke trênê ya ku ber bi tunelê ve diçe bi awayekî reng hatiye sêwirandin. Thaler ê ku ji sala 1980’yî heya îro li ser aqilê çêkirî dixebite, got, ev berhem bi temamî ji hêla algorîtmayên kompûterê ve hatiye çêkirin.
***Ozgûr Polîtîka***



# Ji bo mexdûrên Enfalê pêşbirka wêjeyî

Qaymeqamiya dewleta Tirkan ya dagîrker li Cizîrê, nîşandana lîstika şanoyê ya Kurdî ya bi navê “Mem û Zîn” qedexe kir.
Qaymeqamiya dagirkeriiya dewleta Tirkan, bê ku sedemekê nîşan bide, lîstika şanoyê ya bi Kurdî “Mem û Zîn” qedexe kir. Şermola Performansê wê 12’ê Adarê ev lîstik li ser dikê nîşan bidana. Şermola Performansê, derbarê qedexeya qaymeqamiya dagirker de daxuyaniyeke nivîskî da û got, Qaymeqamiyê ji bo qedexeyê ti sedem nîşan nedaye.
Daxuyaniya Şermola Performansê bi tevahî wiha ye: “Lîstika me ya Mem û Zîn ji aliyê Qeymeqamiya Cizîrê ve bê sedem hat betalkirin.
Lîstika Mem û Zîn, 12’ê Adarê, roja Şemiyê li Navenda Çandê ya Şaredariya Cizîrê wê bihata lîstin, lewre afîş, broşur û dawetiye hatibûn şandin, bi alîkariya gelek saziyan danasînên medyaya civakî hatibûn parvekirin û di 4’ê Adarê de jî kirêya salonê li ser hesabê şaredariyê hatibû razandin. Lê piştî bi du rojan (06.03.2022), Qeymeqamiya Cizîrê bi riya telefonê em agahdarkirin ku pêşandana lîstikê hatiye betalkirin.”
13 caran berê hatibû nîşandan
Şermola Performansê, bi derhêneriya Mîrza Metînî ev lîstik amade kiriye û ji 3’ê Mijdara 2021’an ve li Êlih, Amed, Riha û Qoserê 13 caran hatiye nîşandan.
Ozgûr Polîtîka




# Ji bo mexdûrên Enfalê pêşbirka wêjeyî

BI SERHILDANA 12’Ê A
ŞOREŞA CIVAKÎ BIŞK

Rêxistina Jinên Ciwan yên Têkoşer pêşbirkeke wêjeyî ji bo jinên ciwan yên navçeya Kelarê ya başûrê Kurdistanê li dar dixe.
Rêxistina Jinên Ciwan ên Têkoşer pêşbirkeke wêjeyî ji bo jinên ciwan ên navçeya Kelarê li dar dixe. Pêşbirk gotar, helbest û çîrokan li xwe digire. Kesên di pêşbirkê de bi serketina wê werin xelatkirin.
Rêxistina Jinên Ciwan ên Têkoşer, 9’ê Adarê pêşbirkeke wêjeyî ji bo jinên ciwan ên sînorê navçeya Kelarê dibin dirûşma “xeta tekoşînê bi pênûsa jinan tê nivîsandin” dide destpêkirin. Wê pêşbirk 20 rojan bidome.
Jinên ciwan ên temenê wan di navbera 15-35’an de dikarin heta 1’ê Nîsana 2022’yan bi gotar, helbest û çîrokên xwe tevlî pêşbirkê bibin.
Pêşbirk diyarî wan jinan hatiye kirin yên ku di dema Enfalê de bi dest rejima Beesê hatine revandin û heta niha çarenûsa wan nediyar e.
Roja 2’yê Nîsana 2022’an jî bi merasîmekê kesên serketî wê werin xelatkirin.
Kesên bixwazin tevlî pêşbirkê bibin, dikarin berhemên xwe ji vê navnîşanê re bişînin; adarkurdish74@gmail com
***Ozgûr Polîtîka***



## QUNCIKA TÊGÎNAN

| Bandor | Te´sîr |
|---|---|
| Gengaz | Mûhtemel |
| Girîng | Mûhim |
| Pankart (Fransî) | Di civîn û xwepêşandanan de, karton yan jî cawê gotinên kurt li gorî armancê li ser hatîn nivîsîn: *Di çalakiyê de parkata “Bimire Dagîrkerî” hat vekirin.* |
| Çalak | Kesê her tim di nava liv û tevgerê de. Jîr, jêhatî, zindî: *Miroveki çalak e* |
| Pêvajo | Ji bo demeke diyar: *Di pêvajoya şerê cîhanê de xela çêbû.* |
| Pêwendî | Têkilî |
| Plan (Fransî) | Ji bo pêkanîna karekî yan berhemekî çêkirina rê û rêbazên wê: Plana xaniyê me hatiye çêkirin. *Ji bo êrişa ser dijberê xwe plan çêkirin.* |
| Proje (Fransî) | Di gelak qadan de planeke zanistî ye ku berê hatiye amadekirin, lêçûna wê hatiye hesabkirin, dem jê re hatiye veqetandin û ji aliye rêveberiyê ve hatiye qebûlkirin: *Projeya ava bajêr dest pê kir.* |
| Protesto (Îtalî) | Dijberiya li hemberî, biryar yan jî kiryarekê: *Kurdan Peymana Lozanê protesto kir.* |

## Bersiva jimara borî

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | N | E | Q | E | B | ■ | S | ■ | A |
| 2 | A | ■ | E | Y | ■ | X | E | C | Ê |
| 3 | L | Î | L | A | V | ■ | R | A | ■ |
| 4 | ■ | Z | E | R | ■ | B | A | ■ | L |
| 5 | S | ■ | M | ■ | L | E | Y | L | A |
| 6 | S | B | ■ | H | I | L | ■ | A | V |
| 7 | ■ | E | T | Ê | ■ | Ê | M | ■ | A |
| 8 | A | J | ■ | J | I | ■ | A | D | ■ |
| 9 | B | Î | R | A | ■ | A | K | A | M |

## Xaçepirs

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | ■ | | ■ | | | | | |
| 2 | | | | | | | ■ | | ■ |
| 3 | ■ | | ■ | | ■ | | | | |
| 4 | | | | | | ■ | | | ■ |
| 5 | | | ■ | | | | ■ | | |
| 6 | | | | ■ | | | | ■ | |
| 7 | | ■ | | | | | ■ | | |
| 8 | | | | | ■ | | | | |
| 9 | ■ | | ■ | | | | | | ■ |

**ÇEP-RAST**
1. Gora ji kevir an ji mermer qewartî
2. Ruhber
3. Parsûyên masiyan
4. Sindoqa ku pê qom û tiştên wisa tên pîvan... Dewara nêr
5. Cihê heranê... Alava ku pê hespan tîmar dikin... Peyva neyînî
6. Di dîrokê de dewleteke Kurdan... Heyf
7. Mehek... Jimara du, çar, şeş, heşt û hwd.
8. Jêdera avê... Kesê ku di karekî de xwediyê rayeya fermankirinê ye
9. Meha dawî


**JOR-JÊR**
1. Kurteya elementa Aktînyûmê... Tiştanok, têderxistinok
2. Pirsgirêk... Kurteya ajansa fermî ya Tirkiyeyê
3. Rojek... Demên rojê
4. Afirandina şanoyê ya dilpêşewitîn û pêkenîn pêkve ye... Keleşêr
5. Notayek... Wekhev
6. Genimê hêrandî... Mîrîtiyeke kurdan
7. Kurtebêja Zîvê... Pirç
8. Beşer, mirov... Alava ku datînin ser hespan û li serê siwar dibin
9. Tiştê ku pê debar tê kirin

# `Rojeke reş û bi êş bû`

***Dijwar Xelef got, meha Adarê di nava gelê Kurd de hem meha xemgîniyê; hem jî ya serhildan û kêfxweşiyê ye. Komkujiya Şaredariya Qamişlo ya 11’ê Adara 2014’an jî ji bo gelê kurd bi taybetî gelê bajarê Qamişlo bûyereke xemgîn e û pir bi êş e. R-6***




Ronahî
www.ronahi.net/ku/ Jimar : 948 13-Adar- 2022 Rojnameya siyasî, civakî û çandî



## `Hunermend Mihemed Şêxo ji bo gelê Kurd dibistana hunerê ye`

*Hunermendê Kurd Mihemed Şêxo di şert û mercên herî dijwar de bi hunera xwe bû dengê gelê xwe û ji bo azadiya gelê Kurd bi hunera xwe, têkoşîneke pir mezin kir. 33 sal di ser wefata Mihemed Şêxo re derbas dibin, lê hê deng û awazên wî di nava gelê Kurd de dijîn. R-7*

# BI SERHILDANA 12’Ê ADARÊ ŞOREŞA CIVAKÎ BIŞKIVÎ





## Serhildana 12`ê Adarê bû çirûska Şoreşa Rojava

***Tevî zordariya rejima Sûriyê, sala 2004`an bi sedhezaran Kurd ji bajarê Qamişlo heta paytexta Sûriyê Şamê rabûn serhildanê. Ew serhildan, bû çirûska yekê ya bihara gelan û bingehê destpêkirina şoreşa rojavayê Kurdistanê. R-5***

## Siyaseta PDK`ê û rewşa başûrê Kurdistanê

***Nerîman Ehmed: PDK ji bo parastina desthilatê û berjewendiyên malbatî hebûn û doza gelê Kurd dike qurban. Herwiha ji ber siyaseta wê, rewşa li Başûr wê kambaxtir bibe. R-4***

## `Divê li hemberî êriş û sûcên li dijî jinan têkoşîn xurttir bibe`

***Welîde Bûtî got, rojên salê tev rojên jinê ne. Çimkî jin her roj li ber xwe dide û têkoşîna xwe xurt dike. Li bakur û rojhilatê Sûriyê jî bi hêz û berxwedana jinê şoreş hat lidarxistin. Li hemberî sûcên li dijî jinan tên kirin, divê jin xwe pirtir birêxistin bikin û têkoşîna xwe mezin bikin. R-2***



## Li Amedê ‘Deklarasyona Newrozê’ hat eşkerekirin

***Newroz îsal ku wê li 72 bajarên bakurê Kurdistanê û Tirkiyê bê pîrozkirin, li Amedê bi daxuyaniyekê hat ragihandin. R-3***



**Aboriya dûrî berjewendiya civakê be, terora ekonomîk e**
Idrîs Henan R-5



**12’ê Adarê Qamişlo**
Faruk Sakik R-4



## Armanc ji tecrîdkirina Rêber Apo pêşîgirtina li Modernetiya Demokratîk e

***Rohat Mele Xelîl: Azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocalan tê wateya misogeriya aştiya civakî, demokrasî û azadiyê. Ji bo ku ev pêk neyên tecrîda girankirî li ser Rêber Apo tê meşandin. R-5***

## Nisrînê xiyanet li xewn û xeyalên xwe nekir

“Pêşiya xewna min girtin, berê min dan doktoriyê. Ez bûm doktor lêbelê xewn û heskirina min ya Rojnamevaniyê ji hişê min dernediketin û bi min re mezin dibûn. Bi riya NÛJINHA ev xewna min bû rastî” ***R-6***



# `Divê li hemberî êriş û sûcên li dijî jinan têkoşîn xurttir bibe`

**Welîde Bûtî got, rojên salê tev rojên jinê ne. Çimkî jin her roj li ber xwe dide û têkoşîna xwe xurt dike. Li bakur û rojhilatê Sûriyê jî bi hêz û berxwedana jinê şoreş hat lidarxistin. Li hemberî sûcên li dijî jinan tên kirin, divê jin xwe pirtir birêxistin bikin û têkoşîna xwe mezin bikin.**

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

Têkildarî berxwedan û têkoşîna jinê ya li hemberî dagîrkeriyê, girîngiya 8'ê Adarê û pêwîstiya xurtkirina azadiya jinê, endama Koordînasyona Kongreya Star ya Rojava Welîde Bûtî ji rojnemeya me re axivî. Herwiha da zanîn ku sûcên li dijî jinan tên kirin, dihêlin ku jin li hemberî pergala desthilatdar, pirtir li ber xwe bide û têkoşîna xwe mezin bike.

### `Li hemberî zor û zehmetiyan têkoşîneke mezin hatiye kirin`

Welîde Bûtî Roja Jinan ya Cîhanî li jinên Kurdistan û cîhanê, bi taybetî jinên têkoşer yên bi salan e li ber xwe didin pîroz kir û wiha got: "Di nava civakê de ya herî zêde rastî êriş û sûcan tê jin e. Çimkî hişmendiya heyî jinê qebûl nake. Ev hişmendî ne ji niha ve, bi sedê salan e li hemberî jinê heye. Dijmin her tim di kesayeta jinê de kiryarên qirêj û sûcên giran li ser civakê dike. Jinan gelek zor û zehmetî kişandinê, lê li beramberî wê têkoşîneke mezin hatiye kirin. Ji bo wê, Ji dîrokê heta niha jin li ber xwe dide û li hemberî hişmendiya mêr ya serdest ku jinê piçûk dike û wê xwedîhêz û hebûn nabîne têkoşînê dike."

Welîde Bûtî teqez kir ku rêxistin û têkoşîna jinan dewama deskeftiyên 8`ê Adarê ne û wiha axivî: "Rojên salê tev rojên jinê ne. Çimkî jin her roj li ber xwe dide û têkoşîna xwe xurt dike. Li bakur û rojhilatê Sûriyê jî bi hêz û berxwedana jinê şoreş çêbû. Jin vê şoreşê birêxistin dike û xwedîroleke pir girîng e. Heriwha jinên cîhanê jinên bakur û rojhilatê Sûriyê ji xwe re dikin mînak. Jin bûye pêşenga vê civakê û guhertinên pir mezin di nava civakê de çêkirine. Destkeftiyên jinê yên li bakur û rojhilatê Sûriyê tev berhemên têkoşîna jinê ya dirokî ne. Divê em jî van destkeftiyan biparêzin û li keda xwe xwedî derkevin."

### `Bingehê rêxistina civakê jin e`

Welîde Bûtî bîr xist ku di şoreşa Rojava de jinan gelek berdêl dan û ev li axaftina xwe zêde kir: "Di nava salên şoreşê de, gelek êriş, destdirêjî û komkujî, herwiha sûcên giran li ser jinê hatin kirin. Ji her alî ve (siyasî, aborî, leşkerî) jin dibû amanca dagîrkeran. Li herêmên dagîrkirî jî dijmin her tim êrişî jinan dikir. Çimkî dagîrker jî dizanin bingehê rêxistina civakê jin e."

Welîde şideta li ser jinê ya sala cûyî bîr anî û wiha got: "Sala 2021'ê şideta li ser jinê zêde bû. Çimkî jin têkoşîneke xurt dikin. Îsal têkoşîna jinan ji ya salên borî xurttir e. Ji bo wê dibe ku li ser gelê Kurd û jinan êrişên girantir bên kirin. Ji ber wê ev sal ji bo me pir girîng e. Çawa ku bi berxwedan û pêşengiya YJA



Star`ê ya sala 2021'ê planên mêtingeriyê hatin hilweşandin û êrîş hatin pûçkirin, sala 2022'an jî, bi heman astê û bi berxwedanê wê êrişên metingerî bên şkandin."

### `Sala 2022'yan ji bo me saleke pir girîng e`

Welîde Bûtî got, sala 2022'yan ji bo ku em welatê xwe azad bikin û ji mirovayiyê re bibin mînak, emê heta henaseya xwe ya dawî û bi biryardayeriyeke mezin têbikoşin. Bi vê pêmanê, emê li dijî dagîrkeriya tirkî bisekinin û nehêlin ku xaka me dagîr bikin û îradeya jinê bişkînin. Ji ber wê sala 2022'yan ji bo me saleke pir girîng e. Ji bo ku em azadiya fizîkî ya Rêber Apo û azadiya xwe bi dest bixin, ev sal berpirsyariyeke mezin dide me jinan,

Endama Koordînasyona Kongreya Star ya Rojava Welîde Bûtî di dawiyê de bang li rêxistinên mafên mirovan kir ku li hemberî berpirsên sûcên li dijî jinan hêzeke rastî û çalak ava bikin û ji kesên sûcdar jesan bixwazin, da ku destkeftiyên jinê werin parastin û jin mafên xwe bi dest bixe.


# ŞOREŞ ŞOREŞGERA DIXWAZE

**Di van kêliyan de ji min re şerê hest û ramanan dayîn pir zehmet û bi êş tê.**









Dikevim nava dorpeça hesret û bîranînan. Bê ku hincet û astengiyan derxînim, penûsa şermok dikim zimanê dile xwe. Her ku peyv û hevokek pêşdikeve penûs dibe şervanek hîn bihêztir û wêrektir. Tirsa min tenê ewe ku şerim xwe ji bîr bike û bi wan hestan serxweş bibe. Laşê min dicinîqe û ewrên dikevin şikefta çavên min bi qesrika mijûlankê min de vedişêre. Asoyên demjimera xweyalên min hertim di wan rojên nava rûmeta evîndaran da dicemide. Ref bi ref rêwitiya bajarên şoreşgeran dikim. Bajarê ku bi xwîna şoreşgeran hatiye xwemilandin, sînorên mirinê ji nava dil û ramanan rakiriye û lorikên dayikan tinekiriye. Li şûna şopên çîrokên ber dergûşan îro destana lêhengan tê gotin zarokan ra, liser singa dayikan şoreşgerên bibin xelatê welat mezin dibin. Navê wan zarokan Zehra, Viyan, Rustem, Mazlûm, Cûdî, Peyman, Rodî, Nûcan û bi hezaran wek wan navan bûn û kenê wan zarokan wek destana tolhildana serfiraziyê ser zimanan digeriya. Xwastek û xweyalê her şoreşgerêkê ji bo wan keliyên azadiyê bi wan pakrêwanan re jiyan kirin.

Dema ku ez jî wek her şervanekê dikevim rêwitiya wan keliyan ji xwe ra dibêjim ez şoreşgerek û jinek pir bi şans û hilbijêrim. Hembêza Kobanê wek dayika me tevayan bû, ewqas ji dil û can em hembêz dikirin ku dema xwatir xastinan de jî şewata dil me gerim nedikir. Kobanê mirovahî û gerdûn ronî dikir, şewqa wê evîndarên niştîman diwelidandin.

Di sala 2013'an, me gotina 'Şoreş Şoreşgera Dixwaze' ji Heval Cemal bihîst, ev gotin heya roja me ya îro jî weke gûharekê di bîra me tavahî rêhevalan de dimîne. Erk û berpirsyartiya ji me dihat xwastin pîroz û dîrokî bû. Kelêcana hatî afirandin pirs û nêrînên werin gotin didan ji bîr kirin. Li kelêka wê kelêcanê xemginiyek veşartî dihate jiyan kirin. Hestên jidûrketina çiyan pênase kirin, dibe ku bi çend hevokan neye hûnandin. Ji ber ku çiya ji bona gerîlla qadên azad û rasteqiniya lêgerînê bû. Dibin asîmanên bê dawî de rêwitiya gerîla ber bi qadên şoreşê destpê kiribû.

Sînorên di nava welat de carekdin xwe bi awayekî zindî pêşkeşê me dikir, wan sînoran penabertiya nava kurdistan di anî ziman. Behndayin û dilê hevalan wek birûska lêdida, ji hêrsa lêvên xwe yê qeliştokî dipirçiqandin û wekû dijmin dinava lepên wan de be diranên xwe dişidandin. Li şuna ziman baxive çavan li hev temaşe dikir, kesekê nedikarî gotinekê bîne ser ziman… weke dîmenekê bîranîn Serokatî di hişên wan de zindî dibûn ku çawa Rêbertî sînor bi kelêcan û bi gavên dîrokî derbaz debaz dikir. Di wan kêliyan de her hevalekî bi rihekî fedayî sînorên dorpêçkirina Kurdistanê derbaz dikirin û diçûn gel Rêbertî. Belê… êdî dem hatibû gavên li ser erdnîgariya Kobanê dihatin avêtin, diwarên xapandin û tinekirinê hatin hilweşandin. Watedayin û mêzekirina mirov çiqas kûr û ferêh be, ewqas dikare kesayet mezin, wêrek û dilnizim bi afirîne. Temenê bi çend sal û demsalan hatiye diyarkirin wê bi biryardarî, vîn, hêvî û rêhevaltiyek rast û têrker were jiyan kirin. Dibe ku di dema şahadetê de nav û navnîşanek jî têrker nebe, lê pewîste qet neyê ji bîr kirin ku rêheval û şoreşgertiya serdemê jiyan kirin û dan jiyan kirin.

Şevên bê xew û sar despêkiri bûn. Erd û asîman şer dikir, cenga azadiyê di çend kolanên hilweşyayî da berdewem dikir. Zarokên Kurdistanê wek pêlên deryayê diherikîn kolanên sar. Dengê keleş û bimbeyan edî wek amûrek sitranê ji gûhanre dihat. Dema awaza tililiyan destpê dikir govenda bê sitran dor dihate gerandin. Tiliyên ji şevên zivistanê dicemidîn li ser tetika kelêşê wek agirê dîlê şervanan gerim û geş dibû.

Di kolanan de bêhna xwîn û barûtê tevlîhev dibû, rengê asîman her diçû dişibiya zifta reş, qerînên bê deng ji kesera dilê dayikan dihat. Gotinên bê behnok li ser rûyên ken, keziyên bi destê dayika hatibun hûnandin bejnên zirav dipêçan û dilê her şervanêkê dikeliya bi silavdayîna kolanên Kobanê. Bê ku hev nasbikin di eniyên şer de xatirên ne di cihda ji hev dixastin. Bê ku dûdilî û gûmanek jiyan bikin beramberî bablîsoka xeniqandinê, nefesa azadiyê dikişandin. Peymana serkeftinê hatibû mohr kirin. Sozên şoreşgeran, xeyalên pakrewanan, xewnên lêhengan û nifirên dayikan pêk dihatin. Qada azadiyê govenda keç û xurtên kurdan parzemîna cîhanê dihejand. Tiliyên ser xelekên bomba îro dîlana serkeftinê digerandin.

***Jîn Kobanê/pajk.org***



# `Hunermend Mihemed Şêxo ji bo gelê Kurd dibistana hunerê ye`

**Hunermendê Kurd Mihemed Şêxo di şert û mercên herî dijwar de bi hunera xwe bû dengê gelê xwe û ji bo azadiya gelê Kurd bi hunera xwe, têkoşîneke pir mezin kir. 33 sal di ser wefata Mihemed Şêxo re derbas dibin, lê hê deng û awazên wî di nava gelê Kurd de dijî.**

**Darîn Silê-Qamişlo**

Hunermend Mihemed Şêxo, hunermendekî Kurd û ji rojavayê Kurdistanê ye. Navê wî yê rastî Mihemed Salih Şêxmûs e. Di sala 1948`an de ji dayik bûye û di sala 1989`an de li bajarê Qamişlo ji ber nexweşiya dil jiyana xwe ji dest daye.

Mihemed Şêxo Qonaxa seretayî ya xwendina xwe li gund qedandiye. Herwiha ji bo dewamkirina xwendina xwe di 1965`an de tê bajarê Qamişlo û li dibistana Irûba qonaxa navîn dixwîne. Di sala 1965`an de dema ku qonaxa navîn de dixwend nexweşî di çavên wî de derdikeve û çavên wî lewaz dibin, ji ber wê leşkeriyê nake.


Mihemed Şêxo beriya tembûrê li gelek amûrên muzîkê yên din daye, mîna biziq, bilûr, ûd, keman û gîtar.

### Derketina derveyî Rojava

Ji ber qedexeya stranên kurdî li Sûriyê di 1969`an de hunermend Mihemed Şêxo berê xwe dide paytexta Lubnanê `Beyrûtê`. Li Beyrûtê 2 salan beşa muzîkê dixwîne û wek stranbêj û sazvan dibe endamê Yekitiya Hunermendên Lubnanî. Li wir tevlî komên muzîkê jî dibe wek, Koma Newroz, Koma Serkeftin û Koma Bihar.

### Zindan û îşkencekirin

Mihemed Şêxo di 1972`yan de vedigere Rojava, li bajarokê Rimêlan kar dike, li wir serkêşiya tîma muzîkê jî dike. Piştî vegera li Rojavayê Kurdistanê îstixbarata hikumeta Şamê dev ji şopandina Mihemed Şêxo neqeriya, gelek caran



rastî girtin û îşkenceyê dihat, lê ew ji helwesta xwe venedigeriya û kar û xebata xwe domandin. Nêzî salekê li rojava dimîne û di 1973`yan de bi qaçaxî diçe Başûrê Kurdistanê, piştre bere xwe dide paytexta Iraqê. Li wir di radyoya Bexdayê de kar dike û di demeke kurt de 10 stranan tomar dike.

### 14 kasêt wî hene

Mihemed Şêxo yekem kasêta xwe `Ey Felek` di sala 1975`an de li Mehabadê derxist. Stranek bi zaravayê soranî bû ku yekem hunermendê ji Rojava bi soranî stran dibêje. Bi vî awayî di sala 1976`an kasêta duyemîn jî derxist. Di salên 1980 heta 1982`yan de kasêtên din jî derxistin. Hejmara kasêtên wê bi giştî dibe 14.

Di 6`ê Adara 1989`an de Mihemed Şêxo bi nexweşiya dil dikeve. Yekser wî dibin nexweşxaneya Watanî ya Qamişlo, çend rojan li nexweşxaneyê dimîne û di 9`ê Adarê de jiyana xwe ji dest dide û li pey xwe mîrasek hunerî ji 120 stranan dihêle.

Bi boneya salvegera wefata hunermend Mihemed Şêxo hunermend Sefqan Orkêş axivî û diyar kir ku Mihemed Şêxo ji bo parastina çanda gelê kurd dest bi karê çand û hunerê kir û axaftina xwe wiha domand: "Hunermend Mihemed Şêxo (bavê Felek) Ji bo gelê kurd dibistana hunerê ye. Çimkî di her stranek wî de êşa gelê kurd tê ziman. Stranên wî bi taybetmendiya xwe ya netewî û şoreşgerî dihatin naskirin. Ji guhdaran re çîroka gelê Kurd û azarên wê bi rêya stranan digot."

### `Bi huner û fikirê xwe Kurdistanî bû`

Sefqan Orkêş got, Mihemed Şêxo bi huner û fikirê xwe Kurdistanî bû. Herwiha yek ji wan hunermendan e ku êşa



gelê xwe di nava stranên xwe de digot. Mihemed Şêxo berî 33 salan jiyana xwe ji dest da û niha bûye sembola hunera Kurdî. Di stranên xwe de bal dikişand ser êşa gelê kurd li her çar parçên Kurdistanê. Sefqan da zanîn ku armanca Mihemed





Şêxo ya sereke ew bû ku di rêya stranên xwe de êş û bindestiya gelê kurd bîne ziman û wiha dirêjî da axaftina xwe: "Dema ku Mihemed dest bi hunerê kir di wê demê de ji ber rejîma Sûriyê kesekî nikarîbû gotiba ez kurdim. Lê Mihemed Şêxo tevî ku zext û zordariya rêjîmê, karê xwe yê hunerê dewam kir. Her çiqasî ji hêla rejîmê dihat binçavkirin û di zindanan de zilim didît, lê hê bêhtir bi çand û hunera kurdî ve dihat girêdan. Niha hunermendên kurd dibêjin, me moralê hezkirin û parastina çand û hunerê ji hunermend Mihemed Şêxo girtiye."

### `Evîna wî welatê wî bû`

Sefqan Orkêş diyar kir ku Mihemed Şêxo di her stranê de nameyekê cûda dida derdora xwe û ev yek li axaftina xwe zêde kir: "Di her sitrana Mihemed Şêxo de şîrovekirina zilma li ser gelê kurd de dihat kirin. stanên wî li ser welatparêzî û êvîniyê bûn. Evîna wê jî wlatê wî bû. welatê xwe bi gotinên evîniyê temşîl dikir. Di strana xwe ya `Ay lê gulê gula min` de behsa ala kurdistanê dikir. Armanca wî di vê stranê de giringiya ala kes û sor û zer bû."

### `Ji bo azadiya gelê xwe kar dikir`

Sefqan got, dema Mihemed Şêxo bi kurdî stran digotin, ti kes nedikarîbû ji ber rejima Bais bi kurdî biaxiviya. Hunermendan zor û zehmetî dikişand heta ku stranên bi zimanê kurdî digotin. Stranên Mihemed Şêxo di wê demê de roleke girîng dilîst û pir bi bandor bû. Tevî zor û zehmetiyan jî, Mihemed Şêxo ji bo azadiya gelê xwe kar dikir û her demê bawer bû ku wê gelê kurd ji bindestiyê xelas bibe û azad bijî.

Hunermend Sefqan Orkêş di dawiyê de bal kişand ser rola hunermendan û diyar kir ku ji bo parastina neteweyan rola hunerê pir girîng e û wiha got: "Erka hunermendan e ku bi rêya stranan, êş û azarên gelê xwe bigihînin cîhanê. Herwiha bang li hunermendên kurd kir ku li mebesta stranên Mihemed Şêxo xwedî derkevin, ji ber ku hunermend Mihemed Şêxo çand û hunera gelê kurd parast."

# Pirtûkxaneya jinên rewşenbîr hat vekirin

**Pirtûkxane ji aliyê Rêxistina Viyan ya ji bo bidestxistina mafê jinan diyarî jinên Kerkûkê hat kirin.**

Bi pêmana 8'ê Adarê, Roja Jinan a Cîhanê li bajarê Başûrê Kurdistanê Kerkukê, li tenişta Navenda Rewşenbiran a bajêr a li taxa Îskan, pirtûkxaneyeke taybet ji bo jinan bi navê Pirtûkxana Jinên Rewşenbîr hat vekirin. Pirtûkxane ji aliyê Rêxistina Viyan a ji bo bidestxistina mafê jinan diyarî jinên Kerkukê hat kirin. Di merasîma vekirina pirtûkxaneyê de gelek jinên çalakvan, hunermend û hejmarek kesayetên rewşenbîr û nûnerên rêxistinên bajar amade bûn.

Der barê armanca vekirina pirtûkxaneyê de berpirsa Rêxistina Viyan, Fenar Faruq got, "Me ev pirtûkxane vekir da ku jin karibin li cihekî kom bibin û her wiha jin karibin hişyar bibin û jinên bajar karibin di pirtûkxaneyê de lêkolînê bikin. Me li Kerkûkê cihek nîne ku jin lê li hev kom bibin. Jinên bajarê Kerkûkê ji ber çanda bajarê Kerkûkê rê nade jin biçin cihên komî, ji ber wê me xwest cihekî weke pirtûkxaneyê vekin. Li vê derê peyama me ev e ku pirtûkxane bi vî awayî me li Kerkukê vekiriye û ne pirtûkxaneya dawî ye."

***Ozgûr Polîtîka***



# Şermola bi dosyaya 'Kelepora Çandî' derket

**Kovara wêjeyî û çandî ku li Rojava bi Kurdî û Erebî weşanê dike, jimara xwe ya 13'an pêşkêşî xwendevanên xwe kir.**

Kovarê di vê jimarê de li ser "Kelepûra Çandî" dosyaya xwe amade kiriye. Di vê çarçoveyê de Gulistan Sîdo bi sernavê "Wêjeya Devkî Di Çarçoveya Teyorî û Rêbazên Lêkolînê Yên Nûjen De", Elî Roj jî nivîsa "Kelepûra Kurdî û Parastina wê" nivisiye.

Ji nivîsên hatine weşandin Diyar Bohtî li ser "Emhedê Xanî û Wêje", Nêrgiz Ismayîl li ser "Jin û Mîrateya Çandê" nivîsa xwe pêşkêş kiriye. Li aliyê din Jiyan Bozo jî bi nivisa xwe ya bi navê "Mîtolojiya kulîlka Beybûn û Berfînê" di kovarê de cih girtiye.

Kovarê ji bo vê hejmarê ligel nivîskar, folklorzan Zeynelabidin Zinar hevpeyvînek kiriye û li ser xebatên wî pêre axiviye.

Di kovarê de nivîsên lêkolînî, hevpeyivîn, nirxandina pirtûkan, werger, jin û çand, huner, çîrok, helbest, gotar û raporên wêjeyî cih girtine.

Di vê hejmarê de berhemên van kesan hatine belavkirin: Abdullah Ocalan, Lokman Polat, Selam Hisên, Abbas Abbas, Mihemed Welîd, Cemîl Xoce, Siyabend Siyarojê, Diyar Hemî, Şerîf Mihemed.

***Ozgûr Polîtîka***



# `Rojeke reş û bi êş bû`

Dijwar Xelef got, meha Adarê di nava gelê Kurd de hem meha xemgîniyê; hem jî ya serhildan û kêfxweşiyê ye. Komkujiya Şaredariya Qamişlo ya 11'ê Adara 2014'an jî ji bo gelê kurd bi taybetî gelê bajarê Qamişlo bûyereke xemgîn e û pir bi êş e.

**Darîn Silê-Qamişlo**

**Bi destpêkirina Şoreşa Rojava re Şaredarî jî hatin avakirin. Wê demê şaredarî saziyên sereke bûn ku gel bi rêxistin dikirin û pirsgirêkên wan çareser dikirin. Ji ber vê jî 11'ê Adara 2014`an çeteyên DAIŞ`ê Şaredariya Gel ya bajarê Qamişlo kirin hedef û derdora 11 xebatkar û lêvegerên li şaredariyê şehîd xistin.**

Di Roja êrişê de çeteyan wek komkujiyekê pêk anîn, ketin avahiyê û destpêkê bi çekan xebatkarên şaredariyê kirin hedef, bombe avêtin odeyan û mayînên li ser xwe teqandin. Di vê êrişa hovane de, Îbrehîm Ezîz ku di avakirina Şaredariya Qamişloyê de xwedî kedeke mezin bû, Rewşen Mihemed Zekî, Fehed Ebdulezîz, Mûsa Azad Mûsa, Elî Bora, Cîhan Mûrad, Emîna Bîlal, Ferhad Ebdulezîz Osman, Elaedîn Ebdulîllah, Awaz Mehmûd Mihemed û Helebçe Xelîl ku ducanî bû, şehîd bûn.



Li ser mijarê rêveberê Ofîsa Şopandinê ya şaredariya Qamişlo Dijwar Xelef ku yek ji wan kesên ku şahidê komkujiya Şaredariya Qamişloyê bû, bi pêmana salvegera vê rojê şehîdên 11'ê Adarê û tevayiya şehîdên Kurdistanê bîr anîn û ji me re axivî.

Dijwar Xelef li ser vê rojê wiha got: "Ji ber ku şaredarî nû hatibû avakirin leşkerên parastinê lê tinebûn. Ji ber wê jî çeteyan bi hêsanî dikarîbûn derbasî avahiyê bibin. Êriş di saet 12'ê nîvro de hat kirin. Di wê saetê de şaredarî bê deng bû, berî ku çete derbas bibin, çavdêrên li ber derî şehîd xistin. Piştre derbasî şaredariyê bûn. Dema derbas dibin hevalê me Fehed xwe dide pêşiya wan da ku wan bigre, çeteyek xwe diteqîne û Ferhed şehîd dikeve."

**`8 sal derbas bûn lê êşa hê nû ye`**

Dijwar Xelef diyar kir ku 8 sal di ser komkujiya Şaredariya Qamişlo re derbas dibin lê heta niha jî êş û xemgîniya wê rojê di dilê wan de weke roja bûyerê ye û axaftina xwe wiha domand: "Saziyên gel yên di 2012'an de hatin avakirin yek jî jê şaredarî bûn. Li ser bingeha pêwîstiyên gel ev sazî hatin avakirin û xizmeta gel dikirin. Şaredarî ne saziyeke leşkerî bû, saziyeke sivîl bû ku Kurd, Ereb û Suryan lê dixebitîn. Cara yekê bû ku çeteyên DAIŞ'ê saziyekê bi vî rengî dikirin hedef."

**`Armanca wan şkandina îradeya gel bû`**

Dijwar Xelef li ser armanca çeteyan ji vê êrişê wiha got: "Ji ber ku wê demê






Rêveberiya Xweser nû hatibû îlankirin, çeteyan bi êrişên xwe dixwestin rêveberiyê bişkînin û nehêlin kar û xebata wê dewam bike. Ev Rêveberî ji bo gelê Kurd û gelên herêmê gaveke dîrokî bû. Êrişa li ser Şaredariya Qamişlo jî piştî ragihandina Rêveberiya Xweser bû. Armanca komkujiyê jî zelal bû. Ji bo ku bawerî li herêmê nemîne, herwiha tirsê bixin nava gel û destketiyên gel têk bibin ev êrişe hat kirin. Raste bûyereke pir bi êş bû lê bandora wê li ser me hişt ku em kar û xeebatên xwe xurttir bikin. Ji bo wê jî wek xebatkar û karmendên şaredariyê me, bi domandina kar û xebatên xwe armanca êrişê têk bir û peyama xwe da. Niha jî şaredariyên gel li her bajarê hene, ji bo wê jî vê êrişê armanc û îradeya gelê me neşkand. Her ku em gaveke ber bi azadiyê ve diavêjin, dijmin êriş dike. Lê belê êrişên bi vî rengî û hemû êrişên dijminên gelan, tu carî mirovên ku bi prensîbên xwe ve girêdayî ne, nikarin bê hêvî bikin. Li şûna wê helwesta me xurttir dibe, ku em li ser şopa şehîdên xwe bin."

**`Em her sal şehîdan bîr tînin`**

Dijwar da zanîn ku her sal şehîdên şaredariyê bîr tênin û axaftina xwe wiha qedand: "Xebatkarên me yên di komkujiya Şaredariya Qamişlo de şehîd bûyîn, her sal 11'ê Adarê ji bo bîranîna wan mûman pê dixin û ziyareta gorên wan dikin."

# Nisrînê xiyanet li xewn û xeyalên xwe nekir

**Serbest Etê-Qamişlo**

**"Pêşiya xewna min girtin, berê min dan doktoriyê. Ez bûm doktor lêbelê xewn û heskirina min ya Rojnamevaniyê ji hişê min dernediketin û bi min re mezin dibûn. Bi riya NÛJINHA ev xewna min bû rastî"**

Mamoste: Şagirdno, dema hûn mezin bibin, hûn dixwazin bibin çi?

Helbet ev pirs bi tevayiya zarokan re derbas dibe. Zarok bi xewnên azad û bêsînor bersiva pirsa mamoste didin û paşrojeke bi heskirin ji xwe re hildibjêrin. Lê hêdî hêdî ev xewn ji mejiyê wan tê revandin û windakirin.

**Xewnên zarokan tên dagîrkirin!**

Ew zarokên ku bi heskirinê ber bi xewn û xeyalan ve diçin, li malbatê ku weke saziyeke perwerdeyê ya herî xurt e, mezin û perwerde dibin. Malbat pêşiya xewnên wan digirin û hişmendiyeke li gorî xwe di mejiyên wan de diçînin. Bi van astengiyan malbat xewnên wan dagîr dikin, dikin kole û dikujin. Jixwe dêbavan jî ev hişmendî ji pêşiyên xwe girtiye û di nava civakê de rehên xwe berdane. Di encamê de zarokên ku bi xewnên xwe dixwazin azad bijîn, êdî wê li gorî paşroja malbatê ji wan



re diyar kirî, bijîn. Lê Nisrîn ne yek ji wan zarokan bû û got `Na`.

**Xewna Nisrîn ya zaroktiyê..**

Nisrîn Keleş (21) ji bajarê Qamişlo ye. Sala 2008`an bi malabata xwe re diçin Lubnanê û li bajarê Beyrûdê bi cî dibin. Nisrîn li wir diçe dibistanê û piştî refa 12an bi pileyên bilind diqedîne. Pişt re derbasî fakûlteya tenduristiyê (Tib) beşa Neştergeriyê dibe. Piştî salekê ji ber rewşa Korona, digel xwendina xwe, li nexweşxaneya Aemrîkî wek alîkarê doktorê Neştergeriyê, dest bi kar dike.

Nisrîn wan rojan tîne bîra xwe û wiha ji me re vedibêje: "Malbata min dixwest zarokên wê bibin doktor, mamoste, parêzer û hwd. Lê di hişê min de xewneke min ya zaroktiyê hebû. Bi xewna ku ez bibim rojnamevan min li dinyayê dinêriya û mezin dibûm. Dema min di tv`yan de pêşkêşvan didîtin min xweziya xwe bi wan dianî û dixwest weke wan tev bigerim. Heta xeyalên min berî min mezin dibûn û min xwe bi mêvanan re li ser ekranên TV didît."

**Xewna wê di mejiyê wê de destgîr kirin!**

Nisrîn li ser riya jê re hatî hilbijartin wiha axivî: "Xwesteka dayîka min ji ya min cuda bû. Wê dixwest bibim bijîşk. Ji bêçaretî min xwesteka wê pêk anî. Piştî çûm zanîngehê hêdî hêdî heskirina xwendina ji min re hatî hilbijartin, çêbû. Bêguman destpêkê min zehmetî dîtin, pirtûk û projeyên xwendinê ne hêsan bûn û zexteke mezin hebû. Lê tevî wê min armancên xwe zelal kirin û xwendina xwe bi rêxistin kir. Dibe ku ev jî weke qebûlkirina rewşa heyî be, lê ne xewn û xwesteka min bû. Eger niha dem vegere ezê xewndina ragihandinê hilbijêrim."

**Nisrînê xwena xwe ya winda jinûve dît**

Nisrînê, ku tevî malbata xwe sala 2021`ê ji Lubnanê vedgerin bajarê Qamişlo, çîroka xwe ya nû wiha anî ziman: "Piştî em vegeriyan carekê mêvanên me hatin. Di nava axaftinê de ji min re digotin, Doktor Nisrîn. Min ji wan re got, doktorî xwesteka dayîka min bû, xwesteka min ya berê û heta niha jî



ragihandin e. Yekî ji wan ji min re got, eger ez ji te re bêjim derfeteke ragihandinê ji bo te heye tuyê bikî? Ez matmayî mam, xewna winda jinûve dihat ber çavên min û dibû rastî. Wê demê ji bo beşa erebî pêdiviya Ajansa Nûçeyan NÛJINHA bi nûçegihanan hebû û min berê xwe de ajansê."

9 meh in Nisrîn li bajarê Qamişlo nûçegihana NÛJINHA ye û li ser tecrûbeya xwe wiha axivî: Ez vî karî bi heskirin dikim. Herwisa dibînim ku ev pîşe ji milê armanc û peyaman ve ne dûrî tenduristiyê ye. Di her du pîşeyan de jî mirov rastî astengiyan tê û divê karekî zelal bike. Di karê ragihandinê de hem di qada civakî de hem aliyê pîşeyî de destpêkê min pir zehmetî kişand. Lê hêdî hêdî min ev zehmetî derbas kirin û di karê xwe de serwext bûm.

**`Ezê bibim peyamnêra rastiya têkoşîna jinê`**

Nisrîn diyar kir ku destpêkê agahiyên wê li ser NÛJINHA tinebûne. Di perwerdeyê de ajansê nas dike û wiha got: "Dema min nas kir ku ev ajanseke taybet ya jinê ye, ez hizirîm û min ji xwe re wiha got `Ev der qada te ye, qada xebata te ye`. Jixwe dema ez li derveyî welat, min li ser rewşa Rojava agahiyên rast nedigirin. Bi taybetî li ser rewşa jinê, rol, ked û xebata wê. Bi vegera welat re ev rastî hatin dîtin. Ev jî ji min re di karê ragihandinê de bû piştgirî. Ji ber wê bi pênûs û kamereya xwe ezê bibim eynika rastî û têkoşîna jinê. Ezê bi tevayiya hêza xwe bibim peyamnêra vê rastiyê.

**`Li pêşiya xewnên zarokan nebin asteng`**

Nisrînê herwisa teqez kir ku wê erkê xwe yê mirovî yê tenduristiyê jî bidomîne û bi vê peyamê daxwazî ji malabatan kir: "Mixabin gelek malbat li pêşiya zarokan dibin asteng paşrojeke li gorî xwe bi ser wan de disepînin. Ev jî pir xerab e. Lewra eger mirov bi heskirin jiyana xwe hilnebijêre wê ti carî bi ser nekeve. Ez bi hêvî me ku malbat bi hilbijartin û xeyalên zarokên xwe re alîkar bin û red nekin."

# "Paqijiya bajêr neynika çand û hişmendiya civakê ye"

**Li Helebce û Kerkûkê ciwanan bi rasthatina Roja Cilûbergên Kurdî, dibistanên xwe bi cilûbergên Kurdî xemilandin.**

Li Helebce û Kerkûkê ciwanan bi rasthatina Roja Cilûbergên Kurdî, dibistanên xwe bi cilûbergên Kurdî xemilandin.

Li Peymangeha Teknîkî ya Helebce bi gerandina govendê 10'ê Adarê Roja Cilûbergên Kurdî hate pîrozkirin. Mamoste, karmend û xwendekarên peymangehê bi cilûbergên Kurdî tevlî çalakiyê bûn.

Xwendekara Peymangeha Teknîk a Helebce Serîl Osman got: "Cihê kêfxweşiyê ye ku Kurd îro cilûbergên Kurdî li ber xwe dikin. Ji ber ku bi wergirtina cilûbergên reseniya neteweya xwe pêşanî cîhanê didin. Em miletê Kurd in û divê di her rojê de girîngiyê bidin cilûbergên Kurdî."

Xwendekar Kalê Şiwan jî got, "Ev roj ji bo gelê Kurd gelekî girîng e. Ji ber ku wiha kir ku hest bi Kurdayetiya xwe bike. Em bi van cilên Kurdî dibêjin Kurd hene."

**Li dibistanan cilûbergên rengîn**

Li bajarê Kerkûkê li dibistanan roja cilûbergên Kurdî hate pîrozkirin. Merasîma yekem a li Kerkûkê, li Dibistana Amadeyî ya Azadî ya kuran pêk hat. Merasîma duyem jî li Dibistana Amadeyî ya keçan pêk hat. Di merasîman de mamoste û xwendekaran cilûbergên Kurdî li xwe kirîbûn. Xwendekaran tevî qedexeya hikûmeta navendî jî, alaya Herêma Kurdistanê hilda.

**Zarokan jî cilûbergên Kurdî li ber xwe kirin**

Li Silêmaniyê li baxçeyên zarokan ên fermî û yên taybet jî zarokan bi pirranî cilûbergên Kurdî pêşwazî li vê rojê kirin.

Mamosta Baxçeyê Zarokan, Derya Nazim dibêje, pêwîst e dayik û bavê zarokan wiha wan perwerde bikin ku cilûbergên Kurdî yên resen biparêzin.

***ROJNEWS***





# TEV-DEM: Komploya 12'ê Adarê berdewama Komploya Navneteweyî bû

TEV-DEM'ê diyar kir ku 12'ê Adarê şofenîstên Baas'î komployek li dijî gelê Kurd kirin da ku vîna gelê berxwedan bişkînin û fitneyê di navbera pêkhateyên herêmî de derxîne. Herwiha da zanîn ku ev berdewamiya komploya navnetewî bû û got, Serhildana 12'ê Adarê ji komployan re bû bersiv.

**Navenda Nûçeyan-Qamişlo**

Bi boneya salvegera Serhildana 12'ê Adarê ya Qamişlo, Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) daxuyaniyeke nivîskî weşand. TEV-DEM'ê got, "Serhildana 12'ê Adarê asta rihê şofenîst û nîjadperestî yê zihniyeta Baasê li hemberî kurdan û pêkhateyên din ên Sûriyê eşkere dike. Her wiha asta bandor û teslîmbûna vîna vê rejîma şofenîst ji faşîzma Tirk re derdixe holê."

**Daxuyanî wiha ye:**

"12'ê Adara 2004'an, li dijî gelê me yê Kurd komployeke mezin hate kirin. Ev komplo berdewama komploya navneteweyî bû ku ji aliyê çend şofenîstên Baas'î yên li Sûriyê ve hatibû plankirin û organîzekirin. Armanca wan ew bû ku îradeya gelê me yê berxwedêr bişkînin, çand, nirx û destkeftiyên me tune bikin. Her wiha da ku bi rêya derxistina fitneyên mezhebî di navbera Kurd û Ereb û pêkhateyên din ên herêmê de nakokiyê di navbera çandên civakî de bixuliqînin û di encamê de kurdan neçar bikin ku wan ji warê wan koçber bikin. Lê tavilê ev hewldan veguhertînin serhildana gel ku bi îradeyeke xurt û hevgirtinî ji komployên binkeftî re bû bersiv. Ev serhildan, li tevahî bajarên Rojava û bajarên mezin ên Sûriyê belav bû. Serhildana 12'ê Adarê ku ji bin kontrola rejîmê derket bû bûyereke cîhanî ku bala civata navneteweyî bi aliyê xwe ve kişand. Her wiha rejîma Sûriyê di krîzeke siyasî, aborî û civakî de tengijand û wî neçar kir ku hevsengî û giraniya xwe ya siyasî di hundir de û li derveyî winda bike ku heta roja me ya îro berdewam dike.

Daxuyaniya wê demê yên li ser zimanê serokê rejîmê ku dibêje 'Kurd beşekî sereke ji tevna niştimanî ya Sûriyê ye' daxuyaniyeke girîng ber bi gavên çareserî, diyalogên aştiyane û mizgîniyeke pêkanîna reforoman li Sûriyê û destpêkirina pêvajoyeke nû ve bû. Lê destwerdana dewleta Tirk a faşîst di Sûriyê de proseya siyaseta aştiyane vala derxist û têk bir. Ji vir ve dewleat Tirk a faşîst bendên peymana Edeneyê bi kar anîn û dest bi tesfiyekirina hesabên siyasî yên herêmî û navneteweyî li Sûriyê kir, rejîma Sûriyê li hemerî çareseriyên aştiyane ji berpirsyarî û erkên xwe yên exlaqî reviya. Heta niha jî heman helwestê nîşan dide, nemaze bi Rêveberiya Xweseriya Demokratîk re ya ku hemû tevahî çandên civaka Sûriyê temsîl dike û ji bo Sûriyeke demokratîk, pirrengî, nenavnedî, naskirina nasnameya niştimanî ya Sûriyê bi rêya nivisandina destûreke demokratîk ku mafên hemû pêkhate û beşên civakî misoger dike, dixebite. Heger ne bi vî awayekî be wê alozî dewam bike.

Serhildana 12'ê Adara 2004'an asta rihê şofenîst û nîjadperestî yê zihniyeta Baasê li hemberî kurdan û pêkhateyên din ên Sûriyê eşkere dike. Her wiha asta bandor û teslîmbûna vîna vê rejîma şofenîst ji faşîzma Tirk re derdixe holê, nemaze li gel peymana Edeneyê.

Heta îro, îradeyê vê rejîmê jê hatiye standin. Di demekê de ji aliyê dewleta Tirk ve qada hewayî ya Sûriyê tê binpêkirin û gelek herêmên wê bi taybet Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî ji aliyê wê û çeteyên wê ve hatine dagirkirin û hewla qutkirina beşên din ji xaka Sûriyê têne kirin, ev rejîm bi kîn û nefretê li civaka me ya Kurd dinêre û li hemberî dagirkeriya Tirk û siyasetên wê yên li herêmên Sûriyê, bi taybet ên dagirkirî tu helwestên berpirsyartiyê nîşan nedaye.

Em Tevgera Civaka Demokratîk (TEV-DEM) dibînin ku rewşa Sûriyê ber bi xirabbûnê ve diçe, di hemû aliyan de di valahiyeke



siyasî ya mezin û xeter de dijî. Domandina aloziyê, tê wateya domandina karesteke rasteqîn û mirîneke hêdî hêdî. Sedema vê yekê hilweşandina rewşa aobrî û civakî ye. Em bang li civata navneteweyî, di serî de Neteweyên Yekbûyî dikin ku derbarê vê karesetê de destwerdanê bike.

Em soz didin şehîdên Şoreşa 12'ê Adarê û hemû şehîdên azadiyê ku em ê li ser şopa wan bin, têkoşînê xurt bikin heta ku bighêjin îradeyeke civakî ya azad."

# Li Amedê 'Deklarasyona Newrozê' hat eşkerekirin

**Navenda Nûçeyan**

**Newroz îsal ku wê li 72 bajarên bakurê Kurdistanê û Tirkiyê bê pîrozkirin, li Amedê bi daxuyaniyekê hat ragihandin.**

Kongreya Civaka Demokratîk (KCD), Tevgera Jinên Azad (TJA), Partiya Herêman a Demokratîk (DBP) û Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) li Amedê li hev civiyan. Di civînê de deklarasyona Newrozê hate eşkerekirin.

Hevserokê KCD'ê Berdan Ozturk, Hevserokên DBP'ê Salîha Aydenîz û Keskîn Bayindir, Hevserokê Giştî yê HDP'ê Mîthat Sancar û aktîvîsta TJA'yê Emel Temel; Ji partiyên Tifaqa Kurdistanî Serokên Partiya Komunîst a Kurdistanê (KKP), KDP-Bakur, Partiya Azadî, Partiya Azadî û Mirovan (PÎA) û Komeleya Kurd a Demokratîk a Şoreşger (DDKD) jî tevlî civînê bûn.




Newroz wê îsal bi dirûşma "Dem dema serketinê ye" li 72 bajaran bê pîrozkirin. Metna deklarasyonê bi Kurdî û tirkî hate amadekirin. Metna Kurdî ji aliyê Hevseroka Giştî ya DBP'ê Salîha Aydenîz û metna Tirkî jî ji aliyê Serokê Giştî yê PÎA'yê Mehmet Kamaç ve hat xwendin.

Di deklerasyonê de destpêkê qala dîrok û wateya Newrozê hat kirin û piştre jî polîtîkayên şer ên ji aliyê deshilata AKP-MHP'ê ve li dijî gelê Kurd tên meşandin hatin vegotin. Her wiha di deklerasyonê de daxwaza azadiyê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hate kirin. Dîsa hat xwestin ku zimanê kurdî bibe zimanê perwerdeyê û partiyên kurd neyên lîstika dijminê xwe û li dijî polîtîkayên li ser yekitiya xwe ava bikin. Herwiha bal kişand ser berxwedan, nûjeniya nevrozê û ev peyame hat dayîn: "Di pêvajoyeke wiha dîrokî de em Newroza 2022'an bi şîara "Êdî dema parastina destkeftiyan û bidestxistina mewziyên nû ye" pêşwazî dikin. Newroz destpêka biharê ye, roja hêviyên nû destkeftiyên mezin e. Gelê Kurd ê ku bi Newrozê re xwe ji nû ve afirand, ji bo bidestxistina azadiya xwe ji her demê bêhtir nêzî serkeftinê ye. Em ê Newroza 2022'an weke Newroza azadî û serkeftinê pîroz bikin. Em bang li hemû gelê xwe dikin ku li dora agirê Newrozê bên cem hev, coş, hêrs û serhildana xwe bilind bikin, daxwazên xwe yên azadiyê biqîrînin û dera ku lê ne Newrozê pîroz bikin. Ji bo ruhê berxwedanê yê jinê ku di 8'ê Adarê de derketiye holê bi rihê azadiyê di Newrozê de mezin bikin û ber bi serkeftinê ve bibi, em bang li her kesî dikin ku dakevin qadan û Newrozê bi coş pîroz bikin.

Newroza Azadî û Serkeftina Dîrokî li gelê Kurd, Kurdistaniyan û hemû gelan pîroz be."

# Li Minbicê serçeteyekî DAIŞ'ê hate girtin

**Navenda Nûçeyan**

**Meclisa Leşkerî ya Minbicê ragihand ku şaneyeke çeteyan girt û da zanin ku di nava şaneyê de serçeteyekî DAIŞ`ê jî heye.**

Navenda Ragihandinê ya Meclisa Leşkerî ya Minbicê bi daxuyaniyekê girtina şaneyeke çeteyan eşkere kir. Di daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Piştî ku Hêzên Antîterorê yên Meclisa Leşkerî ya Minbicê li dijî şaneyeke rêxistina DAIŞ`ê ya li Minbicê operasyon pêk anî, Cîhad Cemal Himêdî ku bi navê 'Ezam' tê nasîn, tespît kir. Beriya ku MÎT'a Tirk wî bişîne Minbicê, li bajarê Carablusê bû. Li gorî îtîrafa Ezam MÎT'a Tirk beriya demekê tevî birayê wî Hemam ew girtine. Piştre ew serbest berdane lê birayê wî Hemam girtî ye. Li hemberî serbestberdana wî operasyonên terorîstî pê dane kirin û sûd ji naskirina wî ya ji herêmê re, peywendiya bi şaneyên DAIŞ`ê û serçeteyên wan ên li herêmên Tirkiyê dagir kirine, girtiye.

Di encama operasyonê de, Yekîneyên Têkoşîna li dijî Terorê bi ser kargeha mayinan a li ser rêya Helebê û nêzî Melevaniya Menkoş de girt, her wiha 3 terorîstên din ên şaneyê jî girtin. Piştî şer derket, çeteyekî hewldana revê kir û birîndar bû. Di heman demê de yekîneyan çek û alavên taybet ên çêkirina mayinan girtin. Kalaşnîkofek, 21 alavên teqandinê û gelek alavên çêkirina mayinan hatin desteserkirin. Li gorî lêpirsîna destpêkê Ezam û çeteyên şaneyê gelek teqîn pêk anîne, ji wan teqîna li pêşiya Çerxerêya Şehîdan a Minbicê ku zarok û jin tê de bûn qurbanî.

Yekîneyên Têkoşîna li dijî Terorê hîn jî şaneyên gefan li ewlehiya herêmê dixwin, dişopînin."



# Serhildana 12`ê Adarê bû çirûska biratiyê û bihara gelan

Gelê Kurd bi serhildana 12ê Adarê kompoya rêjima Sûriyê ya derxistina tevlîheviyê di nava gelên herêmê de têk bir, bi baweriyeke bihêz serî hilda û li seranserê cîhanê deng veda.

**Mihmed Xanim / Qamişlo**

12`ê Adara 2004`an rêjima Sûriyê xwest di navbera gelê Kurd û Ereb de tevlîheviyê derxe. Rejimê li dijî gelê Kurd bi alîgirên xwe kar anîn û komkujî bi wan dan kirin. Di encamê de bi dehan Kurd şehîd û birîndar bûn. Li dijî vê komkujiyê gelê Kurd jî rabû serhildanê.



**Planên qirêj yên rêjima Sûriyê ji bo derxistina aloziyê bûn**

12`ê Adara 2004an sibeha roja Înê, tirên ji Dêrazorê ber bi Qamişlo ve ket ser rê û saet li derdora 11:30`an gihîşt bajarê Qamişlo. Ciwanên rêjimê anîn, di tirênê de sloganên nijadperestî yên mîna `Bimirin rêberên Kurdan û bijî Sedam Hisên` diavêtin. Ew ciwan bi hinceta ku alîgirên tîma Fitiwê ya Dêrazorê ne, derbasî Stada 12'ê Adarê bûn. Endamên rêjimê bê vevnêrîn derbasê stadyûmê kirin. Lê alîgirên tîma Cîhadê tev di venêrînê re derbas kirin. Diviya alîgirên tîma Fitiweyê di beşa mêvanan de rûnin, lê rêjimê bi zanabûn tevlî alîgirên tîma Cîhadê kirin.

**Destpêka bûyerê û derketina aloziyê**

Beri destpêkirina maçê re, alîgirên tîma Fitiwê sloganên nijadperestî yên mîna `Bijî Sedam Hisên, rêberên Kurd yên xayîn tine bibin avêtin û bi keviran êrîşî alîgirên tîma Cihaê kirin. Piştî êrîşê hêzên rejimê bi fermana Parêzgerê Hesekê Selîm Kebûl, destwerdan kirin û keober gule li beşa alîgirên tîma Cîhadê reşandin. Ev rewş di dîmenên dezgehên çapemeniyê yên wê demê belav kiribûn jî diyar bû. Di encamê de di gel 2 zarokan, 9 kes şehîd bûn.

**Belavbûna serhildanê li seranserî bajarên rojavayê Kurdistanê**

Piştî vê komkujiyê li bajarê Qamişlo, gel dest bi serhildanê kir û pişt re li bajarên din jî belav bû. Rejima Be`sê bi awayekî hovane êrîşî xwepêşanderan kir. Di encamê de bi dehan Kurd şehîd û bi sedan jî birîndar bûn. Herwiha bi sedan ciwan hatin destgîrkirin. Hêzên rejimê rê nedan ku birîndaran bibin nexweşxaneyan û nexweşxane jî dorpêç kirin.

Roja duduyan Kurdên Rojeva tevan piştgiriya Qamişlo kirin. Heta serhildan gihîşt bajarên weke Heleb, Lazqiye û Şamê jî. Di serhildanan de gelê Kurd daxwaziya mafên xwe û rawestandina siyaseta şovenîs kir. Lê rejima Be`s bi guleyan bersiv da. Roja duduyan ya Serhildana Qamişlo di gel jin û zarokan 24 kes şehîd bûn. Pişt re rejimê dest bi pêla destgîrkirinê kir û ser 2 hezar û 700 kesî re destgîr kirin.

**Rêjima Be`sê kiryarên xwe yên hovane li hemberî serhildana gel domandin**

Rejima Sûriyê roja sisiyan ya Serhildanê siyaseta xwe ya çewisandinê domand; bi sedan kes girtin û Kurdên Rojava 'xirabker' bi nav kirin. Herwiha di çapemeniya girêdayî xwe de, dest bi propagandaya li dijî serhildêran kir û ji alîgirên xwe re got, 'Kurd dixwazin bi desteka Amerîka ji Sûriyê qut bibin'. Herwiha merasimên veşartina şehîdan qedexe kir. 16`ê Adarê welatiyên kantona Efrînê ji bo şermezarkirina siyaseta rejimê herikîn qadan, lê rêjjimê gule li sivîlan barandin û di encamê de 5 sivîlên din şehîd bûn. Bi vî awayî jimara şehîdan bi fermî gihîşt 38 kesan.

**Hevgirtina gelên herêmê komploya rêjima Sûriyê bêbandor kir.**

Serhildanê 10 rojan bênavber dewam kir. Kurd tev beşdarî serhildanê bûn. Ji Ereb jî hin kes beşdarî serhildanê bûn. Ev jî dihat wateya hevgirtina Kurd û Ereban û vê hevgirtinê nîşan dida ku komploya rêjimê têk çûye. Ev serhildan wek destpêka serhildanên gel yên li dijî rejimê hat dîtin. Di heman demê de bû bingehê şoreşa 19'ê Tîrmeha 2012'an.

Di encamê de li rojavayê Kurdistanê Xweseriya Demokratîk, pişt re jî sîstema federal ya Rojava-Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê hatin ragihandin. 18 sal di ser Serhildana Qamişlo re derbas bûn. Stada 12'ê Adarê ku rejimê dixwest bike stada fîtneyê, bûye stadeke wisa ku gelên bakur û rojhilatê Sûriyê tevan himbêz dike. Herwiha sîstema nijadperest bi tevayî bin ket. Şervanên Kurd û Ereb, bi hev re di binê sîwana Hêzên Sûriyeya Demokratîk (QSD) de îro di ber cîhanê tevê de şerê dagîrker û terorîstan dikin.



12'ê Adarê Qamişlo

**Faruk Sakik**

Hin kes Şoreşa Rojava her weke ku di rewşeke defacto de pêk hatibe, pênase dikin. Bi şerê Sûriyê yê sala 2011'an ve girê didin. Lê bingehek û pêvajoyeke vê şoreşê hebû.

Ev herêma Kurdistanê piştî serhildana Şêx Seîd bû mekanê rewşenbîr û welatparêzan. Heta PKK hat avakirin li vê herêmê welatparêzî pêş ketibû. Lê piştî ku li Tirkiyê darbeyeke leşkerî çêbû û PKK derbasî Rojhilata Navî bû, ew welatparêziya Rojava veguhêrî têkoşîna azadiya Kurdistanê. Gelek ciwanên Rojava tevlî nava refên gerîla dibûn û li aliyek jî di warê siyasî de bi rêxistin dibûn.

Di 12'ê Adarê de li Qamişloyê dema ku tîma Fetwa ya ji Dêrazorê û tîma Cîhad a ji Qamişloyê dest bi maça futbolê kirin, hin kesên bi taybetî ji aliyê hikûmeta Şamê ve hatin wezîfedarkirin, ji bo dîktatorê Iraqî Saddam Huseyîn û li dijî gelê Kurd dirûşm qîriyan. Şêniyên Qamişloyê jî nerazîbûn nîşanî dirûşman da. Li ser vê yekê komeke êrîşkar ku berê xwe amade kiribû, bi kêr, kevir û çekan êriş bir ser xelkê Qamişloyê. Polîs û leşkerên rejîma Baas jî li şûna dest li êrîşkaran werdin, yekser êrîşî xelkê Qamişloyê kirin. Di encama gulereşandinê de 2 jê zarok 9 sivîl qetil kirin. Dema ku di 12ê Adarê de li Qamişlo ew bûyer qewimî bi navê PYD'ê partiyek hatibû avakirin.

Ev partî ji vê bûyêrê re pêşengî kir û komkujî veguhert serhildanan. Li gelek bajarên Rojava serhildanan dest pê kir. Gelo heke ev partî-PYD pêşengî nekiriya wê serhildan ewqas li seranserê Rojava belav bibûya? Helbet na…

Baş e em vegerin mijara defacto. Di sala 2011'an dema şerê Sûrî destpêkir, heger kurdên Rojava xeta sêyemêmîn tercîh nekirina û an li kêleka rejima Şamê anjî li kêleka mixalefetê cîh bigirtina, gelo ev şoreş wê pêkbihata? Na…

Xeta sêyemîn çi ye? Paradigmaya Rêber Apo ye. Heger ev xet nehata bijartin û tercîh kirin gelo ew rewşa de facto qîm dikir ku şoreş pêk were? Na…

Di 12'ê Adarê de jî ku PYD tûnebûya gelo wê ev serhildan li seranserê Rojava belav bibûya? Na… Îlankirina rêveberiyên xweser li kantonên Efrîn, Kobanê û Cizîrê di sala 2014'an de ji bo gelê Kurd û gelên herêmê gaveke dîrokî bû. Her ku şer li tevahiya Sûriyê dewam dikir, gelên Rojava xwe bi rêxistin kir û rêveberiya xwe îlan kirin. Bi îlankirina kantonan re êrişan jî dest pê kir. Di destpêkêde El Nusra û piştî demek jî çeteyên DAIŞ êrişî van kantonan kirin. Heger sîstema xweseriya demokratîk nebûya ev kanton wê li piyan bimana? Na…

Heger piştî komkujî û serhildana 12'ê Adarê pêdiviyek bi ewlekariyê nedîtina û YPG-YPJ nehatina avakirin wê Kobanê rizgarbibûya? Na… Îro tehdîd û metirsiya li ser Rojava bê sekn dewam dike. Di serî de dewleta Tirk a dagirker û hin hêzên hegemon dixwazin ew sîstema bi paradigmaya Rêber Apo hatî avakirin ji hole rakin. Dixwestin wek Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî hin deverên din jî dagir bikin. Heger rêveberiya xweser di warê dîplomasiyê de, ewlekariyê û aborî de hin tedbîr negirtina me yê bikariviya pêşî li êrişên Tirkiyê yên dagirkeriyê bigirin? Na…

Dîsa em vegerin mijara defacto. Belê li Başûrê Kurdistan têkoşîneke dîrokî hebû, lê di salên dawî de êdî hedefa wan hêzan de rejîma Baas tune bû. Dixwestin herêmê di nav xwe de parve bikin. Amerika hat û Kurdistanek azad çêbû. Ji bo ku li vê derê sîstemeke xweser tune bû ji bo parastina herêmê û berjewendiyên xwe, xwe spartin dijminê xwe. Heger ew tiştên ku li Rojava qewimîn li Başûr jî biqewimiyana wê Herêma Federa ya Kurdistanê bikaribiya rêveberiya herêmê biparêze? Na…

Ew rihê berxwedana 12'ê Adarê îro li asîmanên Rojava belav bûye.

# Siyaseta PDK`ê û rewşa başûrê Kurdistanê

**Mihmed Xanim-Qamişlo**

**Nerîman Ehmed: PDK ji bo parastina desthilatê û berjewendiyên malbatî hebûn û doza gelê Kurd dike qurban. Herwiha ji ber siyaseta wê, rewşa li Başûr wê kambaxtir bibe.**

Têkildarî siyaseta PDK`ê û rewşa dawî ya başûrê Kurdistanê û Iraqê, endamê Desteya Serokatiya Tevgera Azadiya Civaka Kurdistanê Nerîman Ehmed, ji rojnameya me re axivî.

Nerîman diyar kir ku PDK bi siyesta xwe ji salên 91'î heta niha di mijara qirkirina gelê Kurd de bi dewleta tirkî ya dagîrker re xwedîrol e û axaftina xwe wiha domand: "Têkiliyên PDK'ê yên bi dijmin re qet temsîla gelê Başûr nakin. Lewra ev têkilî di çarçoveya berjewendiyên partî, malbat û kesayetan de ne. Armanca herî girîng ji van têkiliyan ew e ku desthilata xwe biparêze û doza kurdî ji navaroka wê ya esasî derxe; doz, maf û hebûna gelekî dike qurbana berjewendiyên xwe."

**`Civîn û serdanên wan yên herî dawî, nîşanên şkestina êrişa 23`ê Nîsanê ne`**

Endamê desteya Serokatiya Tevgera Azadî herwiha bal kişand ser têkilî û civînên herî dawî, yên PDK û Tirkiyê û ev nirxandin kir: "Di dema dawî de serdan û civînên PDK`ê û dewleta tirkî ya dagîrker pir dibin. Lewra êrişên wan yên hevbeş yên ji 23`yê Nîsana 2021'ê, heta niha didomin -ku bi armanca tinekirina Tevgera Azadî bûn-, di asteke bilind de şkestin. Bi van civînan, plan û komployên xwe yên nû ji bo heman armancê dîzayn dikin".



**`PDK xêrûbêra Başûr ji bo desthilata xwe pêşkêşî dagîrkeran dike`**

Li ser peymanên PDK`ê bi dewleta tirkê ya dagîrker re Nerîman wiha axivî: "Bêguman peymanên PDK`ê bi dewleta dagîrker ya tirkî re bandoreke neyînî li gelê Kurd dike û Iraqê jî hêrs dike. Destûra Iraqê qaşo ji aliyê hikûmeta Herêmê ve -ku desthilata wê bi serkêşiya PDK`ê ye- hatiye erêkirin. Ji ber wê ev peyaman neqanûnî û nehiqûqî ne. Di encamê de Iraq dixwaze tola xwe ji PDK`ê hilîne. Herî dawî jî biryara Dedgeha Federal ya derbarê petrol û xazê de bû. Lê ji ber israra PDK`ê, yê herî zêde zirarê dibîne gelê Kurd bixwe ye. Ji her kesî re belî bûye ku ji dema desthilata Erdogan û AKP`ê de, beşek ji aboriya xwe ji petrol, xaz û xêrûbêra başûrê Kurdistanê digire. Di encama peymana 50 salî de ya bi dagîrkeran re, civak rûbirûyê qeyraneke aborî, siyasî û civakî ye."

Hêjayî gotinê ye ku peyman 50`î salî ya PDK`ê bi dewleta tirkî re, bê agahdariya Hikûmeta Bexdayê ku wê petrol û xazê bifiroşe Tirkiyê; 25`ê Adara 2013`an di navbera Nêçîrvan Barzanî û Erdogan de hat imzekirina. Lê Nêçîrvan Hezîrana 2014an li parlamantoya herêmê bi awayekî fermî ragihandibû!

**'Kî bibe serokkomar ne xema civakê ye!'**

Nerîman di heman demê de helwesta PDK`ê ya li Bexdayê anî ziman û ev agahî dan: "Di salên dawî de diyar bû ku serokkomarî ne para gelê Kurd e, para partî û xanedanan e. Serokkomarî di çarçoveya berjewendiyên madî yên partiyan tenê de bi kar anîn. Ji bo wê di nerîna civakê de jî kî bibe serokkomar jê re ne xem e û ne girîng e."

**`PDK dixwaze wek ku li herêmê kirî, desthilatê li Iraqê jî bixe destê xwe û derî ji dagîrkeram re veke`**

Endamê Desteya Serokatiya Tevgera Azadî li ser armancên PDK`ê axivî û wiha got: "Ji aliyê din ve PDK dixweze wek ku dest daniyê ser desthilata herêmê, li Iraqê jî heman karî bike. Şerê wê jî şerê misogerkirina desthilatê ye û li dijî partiyên kurdî dekûdolaban çêdike. Ev ji bo gelê Kurd zirar û xetera herî mezin e. Perçebûnê di nava gel û partiyên siyasî yên kurdî de kûrtir dike. Lewra bidestxistina serokkomariyê ji aliyê PDK`ê ve tê wateya rêvekirina li pêşiya projeyên dewleta tirkî ya dagîrker li seranserê Iraqê."

**`Wê ji ber siyaseta PDK`ê rewş kamaxtir bibe`**

Endamê Desteya Serokatiya Tevgera Azadiya Civaka Kurdistê di dawiya axaftina xwe diyar kir ku PDK di çarçoveya siyaseta xwe de ya bi Tirkiyê û hêzên Sune re, rewşeke pir bixeter ji bo gelê Kurd tîne û axaftina xwe wiha qedand: "Ne li xema wê ye ka wê rewşa Başûr ber bi kû ve biçe. Armanca wê ew e ku projeyên dewlet tirkî li herêmê xurttir bike. Di encama xurtbûna dewleta dagîrkeran de jî PDK desthilat û berjewendiyên xwe diparêze. Li gorî ku tê payîn wê rewşa Başûr ji ber PDK`ê xerabtir bibe û gefên hikûmeta Bexdayê jî pirtir bibin."



# Serhildana 12`ê Adarê bû çirûska Şoreşa Rojava

Tevî zordariya rejima Sûriyê, sala 2004`an bi sedhezaran Kurd ji bajarê Qamişlo heta paytexta Sûriyê Şamê rabûn serhildanê. Ew serhildan, bû çirûska yekê ya bihara gelan û bingehê destpêkirina şoreşa rojavayê Kurdistanê.

**Jiyan Ebas-Qamişlo**

Rejima Be`sê li Sûriyê her dem neteweya Kurd li ser berjewendiyên xwe xeter didît. Ji bo wê Kurdên Rojava ji gelek mafên xwe yên jiyanê, nasname û biryaran bêpar bûn. Ji bo derxistina dijminayiyê di nava neteweyên li Sûriyê de, siyaseta netewperestiya erebî didan pêş û neteweyên din di nava xwe de didan fetisandin. Di dema desthilatiya rejima Be`sê de, li herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê Kurdan nikaribû doza mafê xwe bikin û yên dikirin jî dihatin kuştin, destgîrkirin û işkencekirin. Heta niha jî çarenûsa gelek mirovên di zindanên rejimê de ne diyar e. Serhildana Kurdan ya 12`ê Adara 2004`an li dijî desthilatiya netewperest serhildana destpêkê bû. 18 sal di ser wê serhildanadê re derbas dibin.

12'ê Adara 2004'an li Stadyûma 12'ê Adarê (Beledî) di dema lîstina maça di navbera tîma Cîhad (ya bajarê Qamişlo) û tîma Fitiweyê (ya Dêrazorê) de, komên şovenîst yên ji aliyê rejimê ve hatîn birêxistinkirin, dest bi avêtina dirûşmên li dijî Kurdan kirin. Li se bersiva Kurdan bi dirûşman, van komên şovenîst êrişî Kurdan kirin. Di êrişê de di gel 2 zarokan, 9 kesên ji qamişlo şehîd bûn. Piştî êrişê gelê Qamişlo serî hilda û serhildan li seranserê rojavayê Kurdistanê û bajarên din yên Sûriyê belav bû. Di vê serhildanê de 40 kes şehîd û bi sedan jî birîndar bûn.

Têkildarî mijarê dayîk û bavê şehîd Ehmed Yusiv ku di wê serhildanê de şehîd bûbû ji me re axivîn. Dayîk Eyşê Berekat wiha got: "Bi pêmana salvegera 18`an ya Serhildana Qamişlo, ez bejna xwe li hemberî şehîdên serhildanê û şehîdên şoreşa bakur û rojhilatê Sûriyê tevan ditewînim. Serhildana gel ya 2004`an li hemberî rejima Be`sê weke bahozê li bajarên Rojava û bajarên din yên Sûriyê belav bû.





**Kurdan li hember pergala zordest li ber xwe da**

Dayîka şehîd Ehmed diyar kir ku rejima Sûriyê xwest vîna gelê Kurd bişikîne û neçarî teslîmiyetê bike, lê gelê Kurd nîşan da ku dikare li hemberî pergala zordest li ber xwe bide û axaftina xwe wiha domand: "Kurd tê gihîştin ku li dijî wan komplo tê kirin, ji ber wê xwe bi rêxistin kirin û li hemberî komployê rawestiyan. Rejima Sûriyê li hemberî Kurdan serî li her rêbazê da. Bi hezaran kes girtin û işkence kirin.

Dayîka Eyşê da zanîn ku di serhildana 12`ê Adarê de gelek guhertinên mezin çêbûn û got, di vê serhildanê de ji kiryarên rejima Be`sê yên hovane re sînorek hat danîn. Di encama berxwedan û fedekariya gelê me de, serhildan li seranserê Rojava û bajarên din yên Sûriyê belav bû. Vê serhildanê Peymana Adana ya di navbera rejima Sûriyê û Tirkiyê de ya li dijî Kurdan eşkere kir. Jixwe piştî peymanê, qanûn hatin derxistin û êrişa ser Kurdan hat destpêkirin. Lê gelê me serî dananî. Berovajî wê ji bo parastina xwe, refên xwe birêxistin kirin û li her derê dest bi çalakiyên protestoyî yên aştiyane û demokratîk kir. Herwiha banga berdana girtiyan kir.

Dayîka Eyşê axaftina xwe bi van gotinan qedand: "Em soz didin şehîdên şoreşa 12`ê Adarê û şehîdên azadiyê ku emê li ser şopa wan bimeşin û li dijî dagîrkeran têkoşîn û berxwedana xwe mezin bikin."

**Hesabê rêjimê berovajî xeyalê wê derketin**

Bavê şehîd Emed, Xelîl Yûsiv jî diyar kir ku pir eşkere bû ku bûyerên 12`ê Adarê ne ji ber xwe çêbûne; bi plan û amadekarî bûn û gotina xwe wiha domand. `Jixwe ji kiryarên piştî êrişê diyar bû ku êriş berê hatiye



plankirin. Lê plan û hesabên rejimê berovajî bûn û xeyalên wê zîvirîn. Lewra serhildana Kurdan ku ji Rojava gihat heta Şamê ne di hesabê wê de bûn. Herwiha çîna siyasî ya Kurd û partiyên tevgera kurdî jî ew texmîn nedikirin. Lê jixwe pir caran bûyerên serhildan û şoreşan wisa derdikevin."

Xelîl Yûsif axaftina xwe wiha qedand: "Bi kurtayî gelê Kurd piştî serhildanê êdî tirs şkand. Ya herî girîng ew e ku çavê rejimê, nijadperest û şovenîstan şkandin. Ew roj ev roj e, têkoşîna Kurdan ya ji bo azadiyê ranewestiyaye. Serhildana 12`ê Adarê jî wê her di dîroka gelê Kurd de li Rojava wek pêngava pêşî ya şoreşa azadiyê bê zanîn.



Fener…..

Aboriya dûrî berjewendiya civakê be, terora ekonomîk e

**Idrîs Henan**

Pir ne dûr e ku rûyê bandora krîz û şerê li Ukranyayê li gelek cihên weke Tirkiyê û Sûriyê eşkere bibe û tesîra wê ya aborî û siyasî berbiçav bibe. Diyar bû ku mirovatiyê bi serdema fînansa kapîtalê re pêşeroja xwe ji dest daye û rûbirûyî cinawirekî antîmirov maye. Tabloya rojane ya bihabûna li van herdu welatên li jor weke mînak hatine destnîşankirin, isbat dike ku sîstemên serdest ên yekdestariyên sermayeyê bi armanca karê zêde, ji hewceyên civakan zêdetir berê xwe dane hilberandina amûrên tinekirina civakan û rêjeyek mezin ji civakê bê kar hiştine.

Di wextekê de ku krîzên aborî yên cidî li van her du welatên navborî tên jiyîn, hilberandina çek û cebilxanê bê navber dewam dike û tevahî çavkaniyên xwezayê bi tinekirina hawîrdorê re hildiweşînin û vediguherînin amûrên karê. Rêber APO vê bêbextiya bi navê ekonomî xwe pênase kiriye weke "Terora ekonomîk" şîrove dike ku civakê aliyê aborî ve diherifîne û bazara ku veguheriye qadeke karê zêde, dorê lê digire.

Tabûrên dirêj ên li ber stasyonên sotemeniyê û yên li ber navendên firotina pêdiviyên xwarin û vexwarinê û firinan, ti cihekî ji şik û gumanan re nahêlin ku yekdestariyên di bin banê netewdewlet de hatine birêxistinkirin, her tiştî bi rêbaz û têgihaştinên ji wateya ekonomiyê re dane avakirin, rave dikin. Weke Rêber APO gotî, 'Ji çalakiyeke Tedbîr û debarê ya pêdiviyên civakê yên madî qulibandine toraneke daqurtandin û tunekirinê.' Daxuyaniyên lihevketî û yên nakok ên rayedarên her du welatan ku hêza wan nîne şûşeyek zeyt li sûkê peyda bikin! wê xisleta yekdestariyên sermayeyê baş diteyisînin. Dema kesekî mîna Ehmed Dawûdoglu ku şoşbanê Tirkiyeya nûjen a îro ne bibêje: "Kirîz li Ukranyayê ye û tabûr jî li cadeyên Istenbûlê ne" cidiyeta rewşê baş tê zanîn.

Gelek eşkere bûye ku tevî zemîna bi xêr, bi bereket û atmosfera guncaw a pêşxistina çandiniya ku dikare civakê têr bike, çîna desthilat ew yek ne li gorî berjewendiya civakê, li gor berjewendiya navenda hegemonîk kiriye. Ji lewra ji sedî 90 ji pêdiviyên civakê ji derve hatine û çarenûsa civakê rehîneyê kapîtalzimê kirine. Ji bona vê jî dema keştiyên zêytê li bendera Rostofê ji aliyê Rûsya ve tên rawestandin, li kolanên Istenbûlê pol û qorên bê talî çêdibin.

Di heman demê de van cureyên kirîzên destpêkê diyar dikin ku rejîmên heyî, jêderên pêxîrtengiyêne û ti carî nebûne hêza çareseriyê. Dema ku ambargoyên çandiniyê li herêmên weke Cizîr û Efrînê ji aliyê desthilatdariya Şamê ve dihatin ferzkirin, bi wê mebestê bûn, ku welat veguhere selikek ekonomiya bi desthilatdariyê re bûye yek. Ango nexşeya aborî ya welêt li gorî berjewendiya hebûna domdar a rejîmê dihate xêzkirin. Ji lewra ti pîvaneke ewlehiyê li van welatan nîn bû. Ji ber wê jî bi bêhna kirîzan re tavilê ji hev dikevin û paşiya wan rût dimîne.

Ji xwe aliyê siyasî ve têra xwe di nav kirîzan de pelçiqî ne ku bi hin gavavêtinên derveyî sînor û xuliqandina berkirîzan re, hwil didin kirîzên heyî perspan bikin. Îro desthilatdariya li Tirkiyê ku siyasetek pirrû dide meşandin, hewl dide qeyrana li Ukranyayê biçewisîne û sûdê ji rewşa hevsazkirinên DYE, YE û Rûsyayê bigire û berê bazirganiya Rûsyayê ber bi Tirkiyê ve bade. Lê dîsa jî ne ji bo berjewendiya gel û civakê ye, ji bo berjewendiya desthilatê û hilbijartinên 2023 ye. Li vir pirsa mirov mereq dike bike ew e. Gelo li welatekî rêzdariya mirov, exlaq û qanûnan nîn be ku kirîza jî isbat kiriye, hêza ti saziyeke navneteweyî nîne ewlekarî û aramiyê misoger bike, dê çiqas ji veberh û bazirganiya biyanî re bijardeyek bi ewle û guncaw be?

# Armanc ji tecrîdkirina Rêber Apo pêşîgirtina li Modernetiya Demokratîk e

**Mihemed Xanim/Qamişlo**

**Rohat Mele Xelîl: Azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocalan tê wateya misogeriya aştiya civakî, demokrasî û azadiyê. Ji bo ku ev pêk neyên tecrîda girankirî li ser Rêber Apo tê meşandin.**

Ji ber felsefeya Rêber APO ya jiyana azad, felsefeyek e ku rizgariya mirovayiyê bi giştî dihewîne, felsefeyeke ku li dijî hemû ferasetên paşverû yên ku ji hêla pergala desthilatdar ve têne meznikirin, têdikoşe. Dewlata tirkî ya dagîrker û bi alîkariya hêzên navneweyeyî, li ser Rêberê gelê Kurd Abdullah Ocalan tecrîda giran dide meşandin.

Di 27'ê Tîrmeha 2011'an de hevdîtina parêzeran a bi Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan re qedexe kirin. Piştre parêzerên Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan di 22'yê Mijdara 2011'an de hatin girtin. Her wiha di 6'ê Cotmeha 2014'an de jî hevdîtina malbatê hat qedexekirin. Di Nîsana 2015'an de jî hevdîtina Heyeta Îmraliyê jî hat qutkirin. Pê re "tecrîda mutleq" dest pê kir. Di encama dewamiya berxwedana bi grevên birçîbûnê, parêzer 2'yê Gulana 2019'an çûn giravê. Herî dawî 7'ê Tebaxa heman salê çûn. Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan herî dawî di 27'ê Nîsana 2020'an de bi rêya telefonê bi çend deqîqeya bi malbata xwe re axive ku ev axiftin di nivîde hat qutkiri û ji wê demê ve heta roja îro ti agahî jê nehatine wergirtin.

Derbarê tecrîda girankirî ya ku li ser Rêber Apo tê meşandin, Hevseroka Ofîsa têkiliyên derve ya Partiya Yekîtiya Demokratîk (PYD) Rohat Mele Xelîl, tecrîda li ser Rêberê Gelê kurd Abdullah Ocalan şermezar kir û wiha dewamî da axaftina xwe: "Tecrîda li ser Rêbertiyê ne tiştekî nû ye, ev 23'ê salin ku ev tecrîd li ser tê meşandin. Ew di mercên pir zehmet de li ber xwe dide. Rêber Apo, Rêber û hêviya hemû neteweyên bindest e, lê mixabin di roja îro de ji ber tirsa ji ramanên wî, tecrîdek girankirî li ser tê maşandin."

Rohat da zanîn ku armanca tecrîdê ku dewleta tirkî dide meşandin, qutkirina rêbertiyê ji gelên azadîxwaz e û wiha domand: "Dewleta tirkî ya dagîrker, dixweza Rêber APO ji gelî wî û ji tevahî cîhanê qut bike. Bi vê yekê hewl didin pêşî li ber Raman û felsefeya Rêber APO bigirin. Ji ber ku felsefeya Serok APO felsefeyekî demokrat û aştiyane ye û mifteya çareseriyên pirsgirêkên herêmê ye."

**'Rêber Apo bi paradîgmaya xwe bûye azadî û demokrasîxwaz ji bo gelên cîhanê'**

Rohat anî ziman ku Hêzên kapîtalîst, desthilatdarên komploger, bi plangeriyekî navdewletî Rêberê gelê Kurd, dîl girtin û axftina xwe wiha domand: "Ev komplo di şexsê Rêber APO de, li ser gelê Kurd û gelên Rojhilata Navî ê hevpeyman û hewldana planên nû yên qirêj dewam dike. Hêzên kapîtalîst, bi armanca tinekirina nirxên civaka azad, wekhev û ji holê rakirina Moderniteya Demokratîk, komplo pêşxistin. Ev pergala ku êdî di sînorê hilweşandinê de dijî, ji bo temenê xwe dirêj bike ev komplo pêk anî. Rêber APO, bi pêşxistina berxwedana dîrokî, bi heqîqeta avakirina jina azad, civaka azad rastiya komplogeran pûç kir. Hêzên komploger, ji ber li hemberî berxwedan û tekoşîna mezin ya Rêber APO bin ketine, bi hêrs in û îro Rêbertiya me di nav tecrîdekî giran de digrin."



**'Hêzên navneteweyeyî di sûcê tecrîde de hevkarin'**

Hevseroka Ofîsa Têkiliyên Derveyî ya Partiya Yekîtiya Demokratîk ( PYD) Rohat Mele Xelîl bêdengiya navnetewyeyî şermezar kir û axiftina xwe wiha qedand: "Em êdî tu bangan li Neteweyên Yekbuyî û rêxistinên navneteweyeyî nekin. Ji ber ku ew ji gelên bindest re çav û gûhê xwe digrin. Em bang li hemû mirovahî û kesên aştîxwez dikin ku dengê xwe li dijî tecrîda li ser Îmraliyê bilind bikin, da ku ev sucê dijmirovî bi dawî bib"